Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1187 | 17-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Bi dengê zîz çar stranê zêrîn stirî



**Di nava dengbêjan de gelek dengbêj hene ku bi sewta xwe, qet nayên ji bîrkirin. Gelek dengbêj jî hene sewt û awaza xwe bi Dengê Radyoya Erîwanê li cîhanê belav kiriye. Yek ji van dengbêjan jî Fatma Îsa ye.**

Dema Radyoya Erîvanê tê gotin yekser dengbêjî tê hişê mirovan û bi taybetî ew dengên ku qet nayên jibîrkirin. Yek ji wan dengbêjên ku bi tîpên zêrîn navê xwe li nav dengbêjan xêz kir û her xwe bi me dide guhdarîkirin dengbêja nemir Fatma Îsa ye. Me jî xwest bi minasebeta salvegera wefata dengbêj Fatma Îsa wê bi bîr bînin û hinekî jiyan û serpêhatiya wê bi we xwînerên hêja re parve bikin. Dengbêj Fatma Îsa di sala 1934'an de li gundê Erezegin ê Ezerbeycanê ji dayik dibe. Hêj 3 salî ye mişext dibe û li gundê Hamzalî yê Ermenistanê bi cih dibin û jiyana xwe li vê derê didomîn in. Ji ber şert û mercên têdeye dibistanê naxwîne. Fatma Îsa di temenê zaroktiyê de dayik û bavê wê jiyana xwe di dest didin û pîra wê, wê xwedî dike.

### Ji dengbêjiyê hez dike

Dema ku temenê wê dibe 14 salî, wekî hemû zarokên kurd bi zora malbata xwe tê zewicandin. Lê belê hêj ji zarokatiya xwe ve dengekî wê yê xweş ku mirovan mest dike heye. Li derdora wê dengbêj hene û ew jî ji kilamên dengbêjiyê hez dike. Jixwe hezkirina wê ya dengbêjiyê wê dikişîne nav dengbêjiyê. Lê wê demê, stranbêjiya jinên kurd ên sunî ji aliyê malbat û derdora wan ve nedihat pejirandin. Stranbêjî wekî gunehekî dihat dîtin. Ew jî ji ber vê yekê kilam û stranê xwe di dîwanên jinan de li cem jinan distiriya.

Di sala 1972'yan de Radyoya Erîvanê ji bo ku hin dengên nû yên jinên kurd ên sunî bibîne lêkolînê dike. Wê demê Fatma Îsa bi palpiştiya bûrayê xwe bi xebatkarên radyoyê re diaxive. Fatma Îsa wê demê wiha dibêje; "Ew jina ku wê demê di Radyoya Erîvanê de stran digotin mîna Sûsika Simo, Zadina Şekir hwd. Kurdên Êzidî bûn. Lê ji bo ku dengê jinên kurd ên sunî jî bê naskirin lêkolînek pêş xistin. Ji ber vê yekê hatin gundê me jî. Wê demê temenê min jî pêşve çûbû. Birayê min ji xebatkarên radyoyê pêşniyar kiribû ku bila min jî guhdar bikin. Wan qebûl kir û min jî guhdar kirin. Min çend stranên klasîk got. Wan ez guhdar kirim û pir kêfxweş bûn. Rojên paşî wan ez birim redaksiyona radyoyê."

Li radyoyê, dengê Fatma Îsa li berpirsyarê radyoyê Xelîl Muradov re pir xweş tê. Fatma Îsa di redaksiyonê de kilamên "De Miho", "Dîna min", "Şerê Reye Beşer", "Gedê Mîrzo", "Derwêşê Evdî" û hwd. distirê û dengê wê tê qeyd kirin. Bi taybetî kilama "De Miho" di dilê kurdan de cihekî girîng digire. Kilama "De Miho" çavkaniya xwe ji evîna keça mîrekî Kurdan Têllî û lawikekî xizan ê bi navê Miho digire. Di kilamê de keçik hezkirina xwe ya ji bo Miho tîne ziman. Fatma Îsa yek carê di radyoyê de dibêje û careke din nabêje. Lê ev car tenê wê dike ku ji aliyê hemû kurdan ve bê nasîn û hezkirin.

Piştî ku Sovyet belav bû Ermenîstanê ji wê derê 50 hezar kes mişext kirin û Fatma Îsa jî yek ji wan bû. Fatma Îsa ku tevî malbata xwe bi mişxtî hatibû herêma Krasnodarê di nav gel de xwedî ciheke bihurmet bû. Dengbêj Fatma Îsa di 15'ê çileya 2010'an de li Ermenistanê jiyana xwe ji dest da.

# Cotkar Hemîd, zêdetirî 120 curê berhemên çandiniyê difiroşe

**Li gundê Teperkure yê ser bi parêzgeha Helebceyê cotkar Hemîd Îsmaîl cihekê bi navê Baxçeyê Kurdistan vekiriye û tê de gelek curên berhemên çandiniyê difiroşe. Rojane û bi berdewam welatî û geştyar serdana kêlgeha Kurdistan dikin û berhemên xwezayî dikirin.**



Cotkar Hemîd Îsmaîl di derbarê berhemên çandiniyê yên xwe û karê xwe de got: "Di baxçeyê min de zêdetirî 120 curên sebzeyan heye. Welatî û geştyar gelek caran dema serdana vir dikin, li gel xwe jî dibin. Ji vane 53 cûrên kulindan, zêdetirî 21 cûrên bacanan, 12 cûrên bacanreşkan, zebeş û bamya di Baxçeyê Kurdistan de hene."

Hemîd Îsmaîl di dewama axaftina xwe de qala sedema vekirina vê cihî kir û wiha domand: "Armanca avakirina baxçeyê û pirrengkirina berhemên xwe, serkeftina berhemên navxweyî ye. Da ku gelê me bizanin ku cotkarên Kurdistanê ji cotkarên li derve ne kêmtirin, gelek zîrektir û jêhatîtirin. Li Kurdistanê û welatiyên me dikarin jê sûd werbigirin. Ax û ava Kurdistanê ji ya ku em difikirin pir biqîmetire. Her berhemek ku li ser rûyê erdê were çandin dikare li Kurdistanê were çandin û welatiyên me jê sûd werbigirin."

Her wiha Hemîd Îsmaîl qala hevkariya hikûmetê û piştevaniya wê bi baxçe re kir û wiha anî ziman: "Hikûmet û aliyên peywendîdar ti hevkariyek madî bi me re nekirine, lê tevî nebûna hevkariyê jî baxçe weke sepetek ya xwarinê ye. Geştyarên ku serdana baxçe dikin, berheman li gel xwe jî dibin. Em li ser gelek cureyên berheman û çawa em berhemên xwe pêşkêşî welatiyan bikin, dixebitin."

Cotkar Şêx Cemal ku serdana Baxçeyê Kurdistan kiriye derbarê mijarê de axivî û wiha pê de çû: "Zeviyên bi vî rengî baştirîn cihên firotina berhemên cotkaran in. Welatî tên û bi destên xwe berheman digirin. Ne ku wek berhemên ku di sarincokan de ji derve têne Kurdistanê. Welatî dikarin bi xwe berhemên xwe bixin bazarê."

**ROJNEWS**

Bi kamîreya Zana Roj



## FERHENGA BIWÊJAN

**Birû ye:**
- Çi tê ber devê wî dibêje; şerm nake; rûyê wî naêşe.

**Bi rûyê xwe stand:**
- Çenda ne bi dilê xwedî bû jî lê li ber da heta ku jê stand; got heta ku stand; ji xwestinê şerm nekir; pir li ber da; bêzar kir.

**Çermê rûyê wî qayîm e:**
- Li ber xwe nakeve; şerm nake.

**Çermê rûyê wî qayîş e:**
- Bi heman wateyê.

**Çermê rûyê wî qetiyaye:**
- Bi heman wateyê.

**Çermê rûyê wî stûr e:**
- Bi heman wateyê.

**Çirîqvirîq lê dixe:**
- Bêşerm e; çi tê ber devê wî dibêje.

**Dide nava kundikan/kundiran:**
- Bêrêz e; rêzê ji ji qanûn û rêzikên derdorê re nagire; mirovekî bêşerm e.

**Dirêjik li rûyê wî diçerixin:**
- Rûyê wî qayîm e; şerm nake; li ber xwe nakeve.

**Gotina pêşî li ya paşî dide:**
- Şerm nake; rûyê wî ji ti kesî naêşe; hema çi tê ber devê wî dibêje.

**Got, pîrê ji carekê re tu çawa yî, got, çi zanim li pêş malan e:**
- Kesên tiştek bi dilê wan be, lê şerm bikin bêjin ji bo wan tê gotin.

**Ebaboz e:**
- Diz e; bêfedî ye.

**Heya xwe avêtiye:**
- Rûyê wî qayîm e; tu çi jê re bêjî şerm nake.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Mîmar û pêşengê têkoşîna azadiyê; Şehîd Hisên Şawîş



Pêşeng û şoreşgerê kurd Hisên Şawîş ji bo serxistina têkoşîna azadiya glê kurd bi şev û roj, li deşt û çiyayên azad bêrawestandin têkoşîneke bê hempa dida meşandin. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re jî di qada civakî, siyasî, çandî û leşkerî de xebateke giranbuha da meşandin.**R-6**

## 'Şoreşa 19'ê Tîrmehê Şoreşa Jinê ye'

Jinên pêşeng yên Rojavayê Kurdistanê diyar kirin ku şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa jinê ye, pêwîste tevahî jin li hemberî êrişên li dijî destkeftiyên jinê bisekinin û nirxên şorşê biparêzin.**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1187 | 17-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ŞOREŞA 19'Ê TÎRMEHÊ HÊVIYA SERKEFTINA MIROVAHIYÊ YE

Ji bo pêkanîna xeyal û hêviyên gelên herêmê di avakirina civakeke exlaqî, demokrasiyeke rasteqîne, biratiya gelan û jiyana hevbeş, di 19'ê Tîrmeha 2012'an de şoreşê dest pê kir û ezmûneke nû li herêmê afirand. Ev şoreş bû hêzeke aktîf ku di gelek qadan de têkoşîneke girîng raber dike û ji bo parastina mirovahiyê fedakariyên mezin dide. Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser Hesen Koçer da zanîn ku şoreşa Rojava ji tevahiya gelên bindest re bû hêviya azadiyê.**R-4**









## 'Bombeyên Erdogan di nav destê wî de teqiyan'

Hevserokê TEV-DEM'ê Xerîb Hiso diyar kir ku gel li herêmên dagirkirî li hemberî nejadperestiya li dijî koçberên Sûriyê yên li Tirkiyê, rabû ser piyan û li dijî dagirkeriya Tirk serî hilda. Herwiha Hiso da xuyakirin ku wekî Tevgera Civaka Demokratîk ew ê herdem ji bo maf û azadiya gelan têbikoşin.**R-3**



Nehîr pale R-2
Kuştina jinê çavkaniya xwe ji kîjan hişmendiyê digre?

Zekî Bedran R-5
Aşîtiya Erdogan hîn bêhtir şer û xirabkirin e




Farûk Sakik R-5
Li Kurdistanê hin pîlanên nû...



Kemal Necim R-7
9`mîn kongreya HRRK`ê... hin têbînî

## 'Şoreşa 19'ê Tîrmehê encama keda Rêber Apo ye'



Hevseroka TEV-DEM'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Ehmed da xuyakirin ku Şoreşa 19 Tîrmehê şoreşa jin û gelan e. Herwiha Rûken destnşan kir ku jina ku berê mafê wê yê axiftinê tine bû, pêşengtiya şoreşa gelan kir û wiha got: "Ji bona em bikarin deskeftîyên şoreşê biparêzin pêwîste em kar û xebatê xwe bighînin asta herî jor."**R-5**

## Ji çiraxên hunera kurdî



Bilbilê Cizîrê, xwediyê dengê resen.Hunermend Cemal Sadûn yek ji navdartirîn hunermendên Kurd û yek ji stêrkên stranbêjiya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê tê hesibandin.**R-7**

# ‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê Şoreşa Jinê ye’

**Jinên pêşeng yên Rojavayê Kurdistanê diyar kirin ku şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa jinê ye, pêwîste tevahî jin li hemberî êrişên li dijî destkeftiyên jinê bisekinin û nirxên şorşê biparêzin.**



Remziya Mihemed



Bêrîvan Omer



Şîraz Hemo



Evîn Ibrahîm



Welîda Botî

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şoreşa Rojava di 19’ê Tîrmeha 2012’an de bi pêşengiya jinên Rojava dest pê kir û li tevahiya cîhanê deng veda, di hman demê de ji tevahiya jinên azadîxwaz yên cîhanê re bû mînaka berxwedanê. Di hemû qadên jiyanê de jinan bi rola pêşengtiyê lîstin û xwe pêş xistin.

Derbarê salvegera Şoreşa 19’ê Tîrmehê de, jinên Rojava ku pêşengiya şoreşê kirin û ji bo serxistina şoreşê hîn jî xebatê didin meşandin ji rojnameya me re axivîn.

**‘Jin di avabûna şoreşê de hêza xwe nîşan da’**

Endama Komîteya Kordînasyona Kongreya Star Remziya Mihemed di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Bi avabûna Kongra Star gaveke geleke mezin hat avêtin û dikarîbû ku di vî alî de fikirê xwe belav bike. Me dît ku di gelek şoreşan de jin di dawiya her tiştî de hatiye hiştin û pir zêde navek jê re nehatiye dayîn, heta di gelek şoreşên kurdan de jî bi vî awayî bû. Her li ser jin û civaka kurdan qirkirnekî siyasî hatiye meşandin. Ji bona vê yekê dema xebatê Kongrs Star hate destpêkirin û bi taybetî bi hatina şoreşê re, jin bi rengekî aktîv tevlî xebatan bû, her wiha di avabûna şoreşê de hêza xwe nîşan da û tevlî hemû qadên civakê bû, kesên li hemberî zilma DAIŞ`ê sekinîn, Yekîniyên Parestina Jin bû. Di aliyê sazîkirina Rêveberiya Xweser de jî jin bi tevlîbûna xwe sûdekî gelek mezin da û xwest xwe bighîne her cihê ku zilm lê heye û li dijî zilmê sekinî. Di sîstema hevserokatiyê de jin cihekî xwe yê taybet girt û di asteke gelekî bilind de hewil da pirsgrîka jinan bi taybet di hundirê civakê de bi riya diyalogan çareser bike.”

**‘Bi fikirê azadiyê bijîn’**

Remziya di dazîn ku pêwîste jin xwe bi têkoşînê re bike yek û wiha domand: “Di herêma me de şerekî gelek taybet ji hêla dewleta tirk a dagirker ve tê meşandin û di heman demê de rojane gef li ser herêma me tê xwarin, li hember wê jî pêwîst e jin sekina xwe bide nîşan. Ji lewra pêwêste her jinek li her saziyekê xwe bi tekoşînê re bike yek û hêza xwe derxe holê. Di heman demê de pêwîst e ku jin di aliyê zanist, perwerde û avakirinê de roleke giran bidê ser milê xwe. Di kesayeta jin de hêvî bi wate dibe. Ji lewra hêviyên me ji bo azadî û wekheviyê gelekî mezin in. Em bi van hêviyan bangewaziya xwe ji bona hemû jinan dikin ku di hindirê civakê de û di saziyên Rêveberiya Xweser de xwedî li şoreşa 19’ê Tirmehê derkevin û em bi hev re van nirxan biparêzin. Mîraseya ku di aliyê Şehîdên Jin de derketina holê pêwîst e em xwedî lê derkevin.”

**‘Desthiladarî ji hêza jin ditirse’**

Di heman çarçoveyê de berdevka Yekîtiya Şaredariyan a Kantona Cizîrê Bêrîvan Omer balkişand ser rola jin di hundirê şoreşa 19’ Tîrmehê de û wiha got: “Gelek guhertin di şexsê jinê de hate avakirin. Jin bi her awayî karî cihê xwe di nava hemû çalakiyan de bigre. Her weha hem di nava qada leşkerî de hem jî di qada siyasî de, jinê cihê xwe girt û gelek gavên ber bi çav avêtin û li ser asta cîhanê bû sembol. Eger em li dîroka desthiladaran meyze bikin, jin her dem bi kirasê kolebûnê hatiye pêçan û bi ti awayî mafê wê yê axeftinê nehatiye dayîn. Gihandina jin di vê astê de hemû bi saye fikirê Rêber Apo ye. Tevlîbûna jinê di qada siyasî û leşkerî de hêz da hemû jinên cîhanê.”

**‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa jinê ye’**

Di heman demê de endama Kordenasyona Kongra Star Şîraz Hemo da zanîn ku şoreşa 19`ê Tîrmehê di rastiya xwe de ji bo jin û civakê qonaxeke dîrokî bû û wiha got: “Xeta ku îro di hundirê şoreşê de dimeşe, bêguman xeta Bêrîtan û Zîlanan e. Herwiha di şoreşa mirovahiyê de, jin gelek gavên mezin avêtin û bû mînaka jiyanê. Rêber Apo jî li ser şoreşê wiha dibêje;‘şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa jinê ye’. Hîmê pêşengtiya şoreşê di serî de jina kurd bû û wiha hemû jinên pêkhateyên di jî tevlîbûn. Jina kurd bû hêviya hemû jinên ku dilê wan ji bo azadî û demokrasiyê lêdide, ji lewra gelek jinên ji derveyî Kurdistanê jî tevlî yekîtiya şoreşa jinan bûn. Ev jî gavek gelek mezin û bi wate ye.”

**‘Ev destkeftî dikeve çarçoveya pêkanîna azadiyê de’**

Şîraz Hemo di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pêwîste her kes bizanibe ku ev destkeftî yên civakê ne, ne tenê destkeftiyê jinê ne, ev destkeftî dikeve çarçoveye pêkanîna azadiyê de. Her kes dikare cihê xwe bigre û bi rolê bilîze, ji lewra ev bi riya zanebûn û perwerdê, pêkane. Ji ber buyîna ku şoreşê bi ser dixe zanebûn û perwerde ye, herdû girêdayî hev in. Li ser vî bingihê, ji me tê xwestin ku em bibin mînaka jina azad û fikirên wê li her derê belav bikin.”

**‘Jina Rojnamevan roleke mezin girte ser milê xwe’**

Endama Desteya Rêveberiya Yekîtiya Ragihandina Jin (YRJ) Evîn Ibrahîm diyar kir ku beriya 12 salan wekî îro çiroska yekemîn wekî şoreşa Rojava li bajarê qehremaniyê Kobanê dest pê kir û koka xwe berbelavî hemû cîhanê kir û wiha got: “Bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê ve hemû jin bi rengekî aktîf cihê xwe di hundirê şoreşê de girtin û tevlî hemû xebatan bûn, jin bû xwediyê şoreşê û bi vî awayî karî bû navê xwe bighênê hemû jinan. Di dîrokê de ev cara yekê ye ku jin ewqas piratîk dide meşandin, ji ber ku beriya niha rastiyeke cuda hebû ku desthiladariya bassê dixwest li ser jinan bide meşandin. Lê bi avabûna şoreşê re jin careke din dengê xwe bilind kir û xeta tekoşînê ji xwe kire bingih. Di heman demê de jin di qada perwerdê de gelek gav avêtin, karîbû nifşên nû perwerde bike, heya dikare bê gotin ku di aliyê zihniyetê de jî xebatek hevpar ji aliyê jinan de hate meşandin. Her weha bi demê re tevlîbûna jinan di qada ragihandinê de jî çêbû, hemû pirsgrîk, buyînên siyasî û şerê ku di herêma me de diqewime bi awayekî lazgîn dighande her deverî. Ji lewra di destpêka şoreşê de Jina Rojnamevan roleke mezin girte ser xwe, hem ji bo xwe tekoşîn dikir û hem ji bo civaka xwe tekoşîn dikir.”

**‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê nefesek da kesayeta Jin’**

Rêveberiya Meclisa Ol û Baweriyan a Bakur û Rojhilatê Suryê Welîda Botî wiha axivî û got: “Ji destpêka şoreşê heya roja îro Jin karî bû ku tevlî her xebatan bibe û qada xwe parestin, êdî Jin dengê şoreşê belavî cîhanê kir. Di heman demê de şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa xwe rizgarkirina ji zihniyeta kevneşop û desthiladar, ji ber ku sîstem ji geşedanên ku dinava civakê de diqewime acize. Her wiha avakirina şoreşê cudahiyekî xwe yê taybet hebû me karî ku em xwe bi dewletê ve nekine yek, herî zêde me bi fikira Neteweya Demokratîk xwe pêçand, me karî bû ku fikra baviksalarî ya ku di hêla dewletê de hatiye avakirin fam bikin û bi helwest nêz bibin. Eger em li dîroka mirovahiyê bi rengekî rast meyze bikin gelek şoreş hatine avakirin, lê ji ber bi demê re ew fikir hat girtin şoreş jî hilweşiyan. Ji xwe em gelek caran di dîroka mirovahiyê de rastî buyînrkî bi vî awayî tên, Jin bê îrade kirine û ew ji mafê xwe yê axeftinê dûr xistine, Jin kirine kirde û zilam kirine nesne, ji lewra ev dibe sedem ku şoreş gavên xwe yên dawî jiyan bike ku şoreşa 19’ê Tîrmehê nefesek da kesayeta Jin.”

**Ji Pênûsa Jin**



**Kuştina jinê çavkaniya xwe ji kîjan hişmendiyê digre?**

Nehîr Pale

Mêr ji xakê çêbûye û jin jî ji parsuyê mêr çêbûye! Di mîtolojî û ol de girîngiyeke mezin ji bo vê hişmendiyê hatiye dayîn.
Di mîtolojiya Sumeran de ku dewlet çêkirine ev hişmendî tê pêşxistin. Ji neslekî derbasî neslê dîtir bûye. Ji cîhanê hejmareke ne kêm bi vê yekê bawer dikin û wisa jî nêzî jinê dibin. Rêber APO dibêje:` Jina weke xwedawend diket zîggûratên Sumeran weke orûsipiyekê ji perestgehê derdiket`.
Di hemû pirtûkên pîroz ên yek xwedayî de jî hatiye nivîsandin ku mêr ji axê çêbûye û jin ji parsuyê mêr çêbûye. Ji derketina Sumeran 4000 BZ. heyanî niha ev hişmendî didome. Dibe ku ev yek buye sedema jin her tiştî li ser xwe qebûl bikin, li hemberî tûndiya li ser wan bêbertek bimînin û her tim şikestî bin. Çawa çûkên fêrî qefesê bûne nikarin dûrî wê bikevin, jin jî zû bi zû nikarin ji mêr dûrbikevin û mêr stara xwe dibîn in. Jin difikirin ku dema ji mêr dûrbikevin bêxwedî dimîn in. Mêr tûndiyê li wan dike, ew dîse direvin gel mêr.
Hişmendiya jinê ji parsuyê mêr çêbûye maf daye mêr ku çawa bixwaze nêzî jinê bibe. Jin ji xwedawendbûnê kirine urûspî, piştre li qesran bûye cariye û niha jî bermalî ye. Jin gihandina asta bibe aşiqê koletiyê. Mêr bi alîkariya civakê zextê li jinê dike ku tenê ji bo wî bijî, wekî dîtir tu wateya jiyana wê nîne.
Di navbera heftiyekê de du buyerên gelekî balkêş qewimîn. Jin çima dighîje asta ku dawî li jiyana xwe û zarokên xwe bîne. Li gundê Zuxeyîr ê Dêra Zorê jinek dawî li jiyana xwe tîne. Temenê wê 29 salî ye, zarokeke wê yê 3 salî heye û ducanî ye. Di meha xwe ya 8`emîn de ye. Di navbera wê û hevjînê wê de pirsgirêk diqewimin û ew diçe gel malbata xwe. Heftiyekê li gel malbata xwe dimîne û zextê lê dikin ku vegere gel hevjînê xwe. Ew bê îradeya xwe vedigere û di heman rojê de dawî li jiyana xwe tîne. Çi bûye sedem ku dawî li jiyana xwe û ya zarokê di rehmê xwe de bîne?
Di têkiliya jin û mêr de pirsgirêk dighîjin asta bibin alozî. Gelek mirinên bi guman ên jin çêdibin. Li gundê Hewayîc Ziyab ê Dêra Zorê jinekê xwe daleqandiye. Ew jî zewicî ye û temenê wê ne biçûke. Guman hene ku ne wê xwe daleqandibe û hatibe kuştin. Jin hemû bûyerên tûndiya li ser jinê analîz nakin, tenê ditirsin. Nayê bîra wan ku li çareseriyê bigerin û ne jî berpirsyartî radikin. Heyanî jin xwe birêxistin nekin û nebin xwedî helwest ev bûyer wê biqewimin. Mêr tucarî bi hişmendiya xwe re nakeve nava nakokiyan, xwe şaş nabîne û kesek hesab jê naxwaze. Hemû bûyerên ku diqewimin li ser wan tê girtin. Jina ji ber zextên mêr, malbat û civakê dawî li jiyana xwe tîne, dibe qurban. Ew jî çima dibe qurban ji ber têkoşîn nake, jina têkoşer nabe qurban û bihurmet dijî, destûr nade ku kesek çarenûsa wê diyar bike û dîroka xwe dinivisîne.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Bilbilê Cizîrê, xwediyê dengê resen.Hunermend Cemal Sadûn yek ji navdartirîn hunermendên Kurd û yek ji stêrkên stranbêjiya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê tê hesibandin, ew yek ji stûnên hunerî yên Kurd , ku bi stranên xwe yên netewî, folklorî û evîndarî navdar e tê hesibandin, ku di nav gelê Kurd li Rojava û Herêma Kurdistanê de deng veda ye.**

**Can Yûsef**



Cemal Sadûn bilbilek bû di dawet, şahî û cejnên Newrozê de stran digotin û bi dengê xwe yê zelal û awazên xweş dilê xelkê bajarê xwe geş dike. Cemal Sadûn, kurê bajarê Dêrika Hemko,hevcêwiya Cizîra Botan û xwişka Zaxoka Bahdînan, bajarê zanist û wêjeyê (edebiyatê), çavkaniya çandû hunera kurdî, navenda folklor û mîrata kurdî ya resen “Deşta Hesina û Herêma Koçera. ”, ku gelek helbestvan û hunermendên Kurd wek helbestvan: (Ehmed Şêx Salih, Omer Lalê , şehîd Zerdeşt Îsmaîl Heybet, Lorî Taldarî û bavê Salar hwd.) anîne jiyanê.
Ji kanî û jêderên xwe yên hunerî gelek hunermend û dengbêjên Kurd, wek hunermend: (Mihemed Teyib Taher, Ebdo Elanê, Silo Koro, Reşîd Elanê, Îbrahîm Bene Qesr, Mihemed Torî, şehîd Dijwar, û gelek hunermend û dengbêjên din ên Kurd) ji kaniyên wê yên hunerî vexwartine.
Hunermend û stranbêjê kurd Cemal Sadûn di 1/6/1958 de ji dê û bavên kurd (Sadûn û Qadriya) li bajarê Dêrika Rojavayê Kurdistanê, di nav malbateke kurd a hejar û kedkar a neteweyî de, ku dildarê huner û folklora kurdî, hatiye dinya ye ku ji neh zarokan pêk tê (pênc kur û çar keç), û ew yê herî mezin di nav birayên xwe de ye, Ji bo debarkirina qûtê jiyana xwe hê di destpêka ciwaniya xwe de bi karên zor û zehmet dixebitî. Cemal Sadûn ne tenê hunermendekî xwedan dengê xweş û hestên nazik navdar bû, ew dildar û evîndarekî bajarê Dêrikê bû, ew beşek ji çanda vî bajarî û hevparê şîn û şahîyên wî bû. Cemal Sadûn li navenda bajarê Dêrikê mezin bû, zarokatiya xwe li kêleka dêra kevin, li ber peravê çemê Dêrikê, li ser tehtên kaniya eskerî , li ber şûnwarên qijleya Fransiyan, di hembêza dehla Naderê,û Buxçeyên Ezîz Çaçan û Necê û di bin siya rezên mêwên tiriyên xuristiyan de, li devera Îndîwerê li tenişta kaniya Xeyda û Pira Bafitê derbas kir, hîn ji biçûkatiya xwe de ji hunerê hez dikir û evîndarê stranbêjiyê bû.
Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo stranên kurdî û folklora kurdî di temenekî biçûk de, di deh saliya xwe de dest pê kiriye, ew li cem xalê xwe Abdo Alanê fêrî stran û muzîkê bûye û wî di dawet û ahengên de li xalê xwe stran vedigerande.
Di çardeh saliya xwe de jêhatiya xwe ya hunerî her ku diçe zêdetir dike, hînî lêdana tembûr û cembşê bûye û bi tena serê xwe dest bi lêxistina cimbişê û stranbêjiyê kiriye.
Ji ber şert û mercên dijwar ên jiyanê, di sala 1980’an de neçar ma ku bajarê xwe yê şêrîn Dêrikê biterikîne û ji bo kar biçe paytexta Sûriyê Şamê , di dema lêgerîna xwe ya li stran û dengbêjan de, hunermendên Kurd ên ku wê demê stêrka wan dibiriqe, wan nas dike û li wir hunermendê nemir Kanîwar nas dike û di sala 1981 de bi navê (Dîlan Geriya li Eyranê, Zincîre Zincîre Way) bi wî re albûma xwe ya yekem tomar dike ,di albûma wî de komek stranên netewperestî, folklorî û evîndarî hebûn.
Di sala 1982’an de vedigere li bajarê xwe Dêrikê û dest bi şehyan û dewatan û vejandina ahengên netewî dike li seranserê herêmê, bi dengê xwe yê zelal , bi awazên xwe yên xweş û bi stranên xwe yên şêrîn di dawetan de hestên mirov û keviran radikir , û di şînan de , çavan hêsir dibarindin dema ku dengê wî yê melûl dibihîstin, wê demê wî stêrên hunera kurdî li Sûriyê nas kirin, wek (hunermend Seîd Yûsif, Seîd Gabarî, Selah Resûl, Merwan Sebrî û hunermend û stranbêjên kurd ên din).
Di xwepêşana xwe ya hunerî de gelek albûm û klîbên vîdeoyî yên ku tê de stranên şoreşgerî, welatparêzî û evîndarî hebûn derxistine .
Mijarên Stranên wî li ser mîrate û folklora kurdî ya dewlemend, li ser evîndarî , heskirin , welatparêzî, şoreşgerî, şîniya şehîdan û pesnê rêberên kurdan bûn.
Stranên wî “Çiçekê”, Min navê te ser dil kula”, “Ala zer ala me ye”, “Koçerê”, “Çûme Dêrikê”, “Dêrika min şêrîne “, “Stêrek geş bû li ezmanî”, “Şer ket girê Çepera “, “Îndîwerê buhare “, “Xalo”, “Hediya Hediya” ji stranên wî yên herî navdar in.
Hunermend Cemal Sadûn yek ji qurbaniyên serjimêriya nerewa ya ku di sala 1962’an de li parêzgeha Hesekê li Kurdistana Sûriyê pêk hatibû û tê de bi sed hezaran kurd ji hemwelatiya Sûriyê bêpar man û heta roja mirina xwe bê belge û nasname ma. Wî dizanibû ku çawa peyv û awazên stranên xwe li gorî dengê xwe yê xweş û qirika xwe ya zêrîn hilbijêre
Piraniya stranên wî ji gotin û awazên hunermend Ednan bavê Hêco , Şevger Mîrza, Mihemed Elî Bavê Salar û hin helbestvanên din ên bajarê Dêrikê û ji folklor û mîrata kurdî ve hatine çêkirin û nivîsandin.
Ji stranên wî yên herî bi nav û deng ku heta roja îro di hişê gel de asê mane û di guhê gelê Kurd de deng vedidin evin:

1- Min navê te ser dil Kula, gotin û awazên Şevger Mîrza.
2- Darmana Tu Nedeyne, gotinên bavê Ceger (Dijan Cûdî), awazê Bavê Hêco.
3- Îndîwerê buhare , gotin û awazên Şevger Mîrza
4- De negrî Narîn , gotin û awazên Bavê Hêco
5- Mona hey Mona gotin û awazên Ebdulqehar Mûsa .
6- Çîçekê gotin û awazên Bavê Hêco.
7- Terka ta nakm, gotin û awazên Şevger Mîrza
8- Tucar dom nakê Zul û Zor ,gotin û awazên Ridwan Dêrikî .
9- Hediya Hediya, gotin û awazên Cuma Êrisî .
10- Tu bi xêr hatî Newrozê, gotin û awazên bavê Hêco.
11- Şêrîn Yarê tehil nabê , gotin û awazê Şevger Mîrza.
12- Vexwe vexwe Yarê vexwe , gotinên Cegerxwîn, awazê bavê Hêco .
13- De bikene yarê Bikene , gotin û awazên Şevger Mîrza .
14- Wa Emîna wa Emîna, gotin û awazên Mihemed Elî Bavê Salar.
15- Bay bay gotin û awazên bacê Hêco
16- Keçê dînê te Şêrînê, gotin û awazên Şevger Mîrza
17- Silav li te Dêrikê, gotin û awazên bavê Hêco .
18- Lo Lawiko evîndaro, gotin û muzîka Radwan Dêrikî
19- Ey Xalo gotin û awazên bavê Hêco .
20- Bese Cemal Bese gotin û awazên bavê Hêco
21- Keçkê dorî min here , gotin û awazên Dewran Bane Qesrî.
22- Negrî ciwanê, gotin û awazên bavê Hêco
23- Ne di xewda me ne şiyarim, gotin û awazên Cuma Êrisî
24- Lê Metlo - Koçerî, gotin û awazên Lorî Tildarî.

Hunermend Cemal Sadûn ji ber hestê xwe welatparêzî û stranên xwe yên netewî rastî gelek zextên ewlehiyê, zindan û îşkenceyên hêzên ewlekariya Sûriyê hat û rê nedan wî ku şahiyên netewî vejîne û stranên şoreşgerî û niştimanî di pîrozbahiyên kurdî de pêşkêş bike, lê wan hemûyan zextan nekarîn rê li ber wî bigirin ku ji bo evînê, ji bo jiyanê, ji bo şoreşê û ji bo doza xwe lêbêxe û stranan bibêje. Karîbû xwe bêxe dilê evîndarên xwe de û hevrêtiya wan di şîn û şahiyan de bike, nêzîkî gelê xwe û tevgera xwe ya siyasî bû û dilsozê doza xwe û netewebûna xwe bû.
Cara dawî di sala 2009’an de tevî hunermend Nîhad Yûsif û muzîkjen Dijwar Abdullah bi buhaneya ku di daweteke Dêrikê de stranên neteweperestî pêşkêş kirine, weke (Ey Felek Felek, Ala zer ala me ye ) ,ew sê mehan girtin û xistin zîndana Elaya bi tawana handana nakokiyên mezhebî hatin girtin.
Ji bo şikandina îradeya wî û rûmeta wî wekî hunermendekî kurd ê navdar , ew li qawîşa diz û sûcdaran hat bicihkirin , di wê demê de ez di wê girtîgehê de girtîyekî sîyasî bûm û me ji rêveberiya girtîgehê xwest ku ji ber şert û mercên wî ên aborî yên zehmet wî veguhezînin qawîşa me da ku em bikarin alîkariyawî bikin , sê roj şûnda, ew hate veguhestin ji bo qawîşa me, û em du mehan bi hev re di heman qawîşê de man.
Piştî ku ji zindanê derket û piştî îşkence, zindan û girtin, kete nav pêlên derya û berdê xwe da rêya mirinê û ji Sûriyê reviya, her çendî ew bi xaka welatê xwe ve girêdayî bû, mîna girêdana darekê bi axê ve , lê şert û mercan ew neçar kirin ku dev ji welatê xwe Dêrikê berde û bikeve ser rêya dûr û dirêj a sirgûnê, ji ber zextên ewlekariyê û şopandin wî ji aliyê rayedarên ewlekariya Sûriyê ve . .
Lê axînî yê (ezabê) sirgûnê dilê wî xwîn kir û hesret û bêrîkirina bajarê wî Dêrik, dilê wî tijî xem û jan kir ,wî hez nedikir ku li Elmanya, Bulgarîstan û welatekî din bijî, ji bilî ku vegere hembêza bajarê xwe, Dêrikê, heya ku di roja 30/3/2014 de li nexweşxaneyek li Bulgaristanê çavên xwe yekcar danî serhev û jiyana xwe ji dest da, piştî ku rewşa wî ya tenduristiyê xirab bû , bêyî ku xatir ji yara xwe ya sermedî Dêrikê bi xwaze û termê wî yê pak bo herêma Kurdistanê û ji wir jî bo bajarê wî bajarê Dêrikê hat veguhestin, û bi hilgirtina li ser milan û bi merasîmekî girseyî yê gelêrî hate oxirkin di nav axa bajarê xwe Dêrikê û li (goristana kevnar) de hat veşartin. Raste ku bi laşê xwe koça dawî kir, lê sax di dilê hezkiriyên xwe de ma û di bîrdanka huner û stranbêjiya kurdî de bê mirin jiya , herwiha stran, awaz û dengê wî di dilê bi milyonan kurde û di qirika dengbêjên wan de zindî ma.
Hunermend Cemal Sadûn zêdetirî çil salên jiyana xwe di xizmeta mîrate û strana Kurdî de terxan kir, stranên gelêrî û mûzîka Kurdî di sîng û dilê xwe de hilgirt û ji ber êrîşên dijminane yên neyarên Kurdan piştgirî kir di parastina wê de ji windabûnê . .
Koça wî di qada hunera kurdî de valahiyek mezin hişt, lê mîrasa wî ya muzîkî û hunerî û stranên wî dê demek dirêj di bîra hezkir û temaşevanên wî de deng vede.
Ji bo ruhê wî yê pak rehmet û rûmet
Ji têkoşîn û mîrasa wî ya hunerî re mayînde û berdewamî

**Têbînî**



**9`mîn kongreya HRRK`ê… hin têbînî**

Kemal Necim

Dawiya hefteya derbasbûyî li bajarê Qamişlo, nehemîn kongreya Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê hate lidarxistin. Li gorî rotîn û protokolên naskirî kar û barên kongreyê birêve çûn û bi encamên diyar û pêşniyar û plan û bername bi dawî bû.
Kongre bi durişmeya “Ber bi rewşenbîriyeke Kurdî ya resen ve” hate lidarxistin. Weke endamekî komîteya amadekar ya kongreyê dema ku me ev durişme bilind kir, mebesta me ku em hewl bidin tiliya xwe deynin ser hin kul û birînên ku di laşê qada rewşenbîriyê de kûr dibin û lihêm digrin. Di kongreyên berê de durişmeyên me girêdayî rewşa giştî ya welêt bûn, me dixwest bi rêya durişmeyên mîna “Em li vir in” sozdariya qada rewşenbîrî bi êş û azarên vê xakê ve bidin diyarkirin û weke rewşenbîr bêjin ku rayên me di vê axê de kûr bûn e û emê hewil bidin ku sozdarê xwîna ku hatiye rijandin bin. Lê serê çend salan e di vê qada rewşenbîriyê de gelek kurt û kêmasî û derd û kul kûr bûn, êdî rewşa vê qadê pir şêlo bû û dike ku rewşenbîr nasnameya xwe ya Kurdî ji dest bidin. Lewma me xwest ku bi vê durişmeyê hewil bibin lêvegerkê pêk bînin û li nasnameya xwe ya resen bigerin.
Me hewil da ku kongreya xwe dûrî wan protokolên giran û fermî li dar bixin, lewma tenê endamên HRRK`ê hatin vexwendin û bêyî rê û resmên vekirinê yên fermî û axaftinên mêvanan û pîrozbahî û HWD, me dest bi kar û barên kongreyê kir. Mirov nikare bêje ku gotûbêjên pir kûr û bi bandor hatin kirin, lê dîse HRRK`ê di kongreya xwe de hin rêgezên xwe parast in.
Di bin bandora hin bîr û boçûnan de, hin endamên kongreyê ji hin xalên rêziknameyê ne razî bûn û xwestin ku guherînê pêk bînin. Yak ji wan xalan ew bû ku ji mercên endametiyê pêwîste ku kurd be û ji Rojavayê Kurdisanê yan Sûriyê be, bi salan HRRK`ê ev rêgez parast, ne weke helwesteke nijadperest, lê weke mafekî ku mafê rewşenbîrên Kurd ên vî welatî heye ku sîwaneke wan a xurû kurdî hebe. Li gorî hin endaman ev xala rêziknameyê helwesteke nîjadperestî ye û xwestin ku deriyên HRRK`ê ji rewşenbîrên netewên din re jî bête vekirin. Lê piraniya endaman ev bîr û boçûn ne pejirandin. Ji xwe berê di rêziknameyê de xalek heye dibêje ji mafê rewşenbîrên ji netewên din ên ku dost û alîgirên netewa Kurd û doza kurdan ya azadiyê ne yan xizmet ji bo wê kirine, bibin endamên rûmetê yên HRRK`ê.
Mijareke din ku hate gotûbêjkirin, hin endamên kongreyê xwestin mijara koteya jianan têxin rojevê, xwestin ku komîteya taybet a jinan bête avakirin û koteya jinan di komîteya rêveber de were destîşankirin. Lê ji xwe HRRK`ê bêyî cudahiya zayendî endametiya hevgirtinê û mafê berendametiyê û hilbijartinê bi wekhevî dide hemû endaman û mercên endametiyê jî li gorî asta rewşenbîrî hatine destnîşankirin ne li gorî çîn û zayendan. Her çiqas ev pêşniyar û nêrîn jî nehat pejirandin, lê di encama hilbijartinên komîteya rêveber de ji 9 kesan 4 jê jin bi xwezayî û bêyî kota derketin û bûne endamên desteya rêveber.

# Mîmar û pêşengê têkoşîna azadiyê; Şehîd Hisên Şawîş

Pêşeng û şoreşgerê kurd Hisên Şawîş ji bo serxistina têkoşîna azadiya gelê kurd bi şev û roj, li deşt û çiyayên azad bêrawestandin têkoşîneke bê hempa dida meşandin. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re Şawîş di qada civakî, siyasî, çandî û leşkerî de xebateke giranbuha da meşandin.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Fermandar û şoreşgerê Kurd Hisên Şawîş di sala 1958'an de li gundê Beroj (Qereçoxê) ê Koçeratan ê girêdayî Dêrika Hemko ji dayîk bûye. Ji êla Mîra ya koçeran e. Şawîş di hembêza çiyayê Qeraçox û li beramberî çiyayê Cûdî yê Bakurê Kurdistanê mezin dibe. Dibistana seretayî li gund, a navîn li dibistana Zekî Arsozî û piştre jî li Dêrika Hemko xwendinê dewam dike.

Di Sala 1982'an ew navê xwe li fakulteya çandiniyê a zanîngeha Şamê qeyid dike. Lê ew xwendina xwe berdewam nake û dest bi xebatên siyasî dike. Destpêke tevlî komunîstan dibe, piştî wê tevlî Çepê Kurd dibe. Li gel xebatên siyasî sala 1984'an leşkertiya Sûriyeyê dike.

**Tevlîbûna Tevgera Azadiyê**

Şawiş berî biçe leşkeriyê sala 1982'an bi rêya xwendina parastina kadroyên PKK'ê yên girtîgeha Amedê Tevgera Azadiya Gelê Kurd dinase. Bi berxwedaniya wan bandor dibe û biryara têkoşînê dide. Sala 1985'an weke milîsekî bi ERNK'ê re dest bi xebatê dike û 1985'an tevlî Tevgera Azadiya Gelê Kurd dibe. Heyanî demekê bi Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan re dimîne. Tevlî dewreya perwerdê ya Akademiya Masûm Korkmaz a li Lubnanê dibe. Perwerdeya wî şeş mehan didome û piştre derbasî xebatên civakî dibe.

**Ji deştê ber bi çiya ve**



Şawêş li paytexta Sûriyê Şamê, Helebê, Amûdê û Dêrika Hemko doza gelê Kurd belav dike û gel bi rêxistin dike.

Têkoşîna wî bi xaka Rojava û Sûriyê re sînordar namîne. Sala 1989'an derbasî çiyayê Bakurê Kurdistanê dibe. Ji deştê derbasî çiya dibe, ew cara yekem e ku dê di nava şert û mercên çiya de bijî. Her ji dûr ve li çiyayê Cûdî dinêrî, êdî ji nêzve pêre dijî, destê xwe dide xaka wî welatî, para xwe ji tîrêjên wê digire û dest bi gerilayetiyê dike.

**Kedkarê zimanê Kurdî bû**

Sala 2007'an di konferansê damezrandina saziya ziman de ku li Kobanê hatibû lidarxistin, Şawîş wekî Serokê Saziya Ziman tê hilbijartin. Her wiha yek ji damezrênerên Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) bû.

Li ser herêma Koçeratan pirtûka bi navê "Lêkolîna civakî, çandî û dîrokî ji jiyana civaka koçeratan ku hatiye jibîrkirin" ku bi zimanê Erebî nivîsand. Her wiha pirtûka helbestan a bi navê "Li hev kombûn û Pênûsa min" dinivîsîne. Helbestên Nîzar El-Qebanî ji Erebî werdigerîne bo Kurdî. Çîrokan dinivisîne û ji kovara Dengê Kurdistan, El-Şeriq El-Ewset û ji rojnameya Ronahî bi navê Sicil El-Eswed gotaran dinivisîne.

Derbarê Salvegera Şehadeta Hisên Şawîş de sernivîskarê kovara şermola Dilşad Murad ji Rojnemeya me re axivî. Dilşad Murad diyar kir ku Şehîd Hisên Şawîşe bû mîrateya şoreşa gelê xwe yê berxwedêr û wiha got: "Ji xwe şoreş dema tê avakirin xwedî pilan û piroje ye, ji lewra avakirina hîmê şoreşa Bakur û Rojhilatê Suriyê li ser bingeha avakirina Rêveberiya xweser bû. Li ser vî bingehî Şehîd Hisên Şawîş bi awayekî mezin berê xwe da qada zanist û zanebûnê ku çareseriya hemû pirsgirêkan xwendin didît, hem dixwend hem jî bala ciwanan dikşand ser xwendinê. Ji xwe tê zanî ku ji hêla Dewleta Tirk a dagirker ve jî hate binçavkirin û nêzî 15 salan di zindana Amed û Adaneyê de ma. Lê bi ti awayî rojek ji rojan bê hêvî nebû, her xwesteka wî ya zanist û zanînê hebû, ji bona vê yekê dema ku di zindanê de bû jî xwe fêrî çend zimanan kir, gelek gotar bi sernavên cuda nivîsandin. Di heman demê de ji bona hevalên xwe jî bû nimuneyekî jiyanî, xezîneyek bû hem digirt û hem jî parvedikir. Dema ku ji girtîgihê derket careke din derbasî qada tekoşînê û tevlî gelek xebatên bi hêz bû. Di heman wextê de di avakirina komîteya ziman de jî wekî Rêberê yekemîn hate hilbijartin, ji xwe di aliyê wêjeyî de jî bi taybet li ser asta herêma me gelek gav avêtin û xebatên ziman û wêjeyî da meşandin."

**'Ji bo me bû mînaka jiyanê ye'**

Derbarê pirtûkên ku Hisên Şawîş nivîsandiye û hatine çapkirin, Murad wiha got: "Hisên Çawîş di demeke Kurt de dest bi amedekirina gelek pirtûkan kir ku yek ji wan pirtûkan Rêzên jibîrkirî ji jiyana civaka koçeran, afsaneya şehadetê, di dîroka me ya wêjeyî de û hijmarek dîwan jî nivîsandin. Piştî şehadeta wî hemû nerîn û nivîsên wî di pirtûkên cuda de hatine bicîkirin. Her weha ji milê Rojnameya Ronahî ve pirtûka wî ya Rûpela Reşa hate çapirin, min bi xwe serperştiya wê pirtûkê dikir. Hisên Çawîş yek ji damezrînerê tevgera civaka demokratîk a ku di sala 2011'an de hate avakirin, ji aliyê perwerdê de jî xwedî tecrubeyekî mezin bû, bi ti awayî rojekî ji rojan xwe neda paş, negot ez westiyam. Ji bo me bû mînaka jiyanê, dema şoreş hate ragihandin Hisên Şawîş amade bû û tevlî xwebatên Rêveberiyê jî bû. Her dem dixwest ku dengê şoreşê belavî



cîhanê giştî bike, bi hevalên xwe re her roj li ser kar bû û westandin ji bo xwe nedikir hêncet."

**'Şehadeta Şawêş bandoreke mezin li ser gel kir'**

Sernivîskarî Kovara Şermola Dilşad Murad di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Di sala 2014`an de piştî ragihandina Xweseriya Demokratîk Şehîd Hisên Şawîş Cîgirê Hevserokê Desteya Perwerdê de hate hilbijartin, ji xwe piştî wê Hisên Şawîş dest bi amedekirina cihên ku ji bo civak û ciwan xwe lê perwerde bikê, di wê qonaxê de de zanîngeha Rojava hate avakirin û nifşên nû hate perwerde kirin. Di sala 20151an de Hisên Şawîş derbasî xwebatên Yekîniya Parestina Gel ya Akademiyên YPG'e bû. Tê zanîn ku şehîd Hisên Şawîş di roja 20`ê Tirmeha 2016`an de, di dema bi erka xwe ve radibû di encama qezayekî de Şehîd bû. Şehadeta wî bandoriyekî gelek mezin li ser gel kir, ji ber ku xwe gihandibû astekî wiha ku hemû pirsgirîkan çareser bike."

# `Emê jiyanê ava bikin û vegera Efrînê misoger bikin`

**Zana Roj/ Şehba**

**Her çiqas polîtîkeyên dijmin yên pûçkirin û têkbirina îradeya koçberên Efrînê bi dorpêç û topbaranan tên kirin, lê li hemberî wê jî helwesteke xurt li ser bingeha vegera Efrînê tê raber kirin. Dayîka Xalîde rûxmî hemû şert û mercên zehmet yên jiyanê bi xwedîkirina pez û berhemên wê dabara jiyana malbata xwe dike.**

Yek ji navnîşeyên gelê Efrînê ew têkiliya wan bi xweza û xwedîkirina pez û berhemên lawirvaniyê ye. Efrîn di kedîkirina lawiran de xwedî risteke, di asta yekemîn de beskirin û têrkirina xwe ya hundirîn ji berhemên herêmê digirt. Ev yek dibû sedema têrkirina hundirîn û derxistina derveyî herêmê jî. Piştî dagirkirina herêma Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirk û komên çeteyan ve, û derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re, gel bi rê û rêbazên cur be cur debara jiyana xwe kirin û careke din rûxmî hemû şert û mercên zehmet yên jiyanê li ser lingan sekinîn û berxwedaniya xwe ji 6 salan ve ji tavahî cîhan û dijmin re raber dikin. Li ser vê bingehê gelek malbatên ji Efrînê li herêma Şehbayê bi berhemên lawirvaniyê debara jiyana xwe dikin. Yek ji wan malbatên ku pez kedî dikin û ji berhemên wan debara xwe dikin, malbata dayîka Xalde Ziyad ya 55 salî ye ku ji gundê Soxunekî yê navçeya şêrawa yê ye.

Malbata dayîka Xalîde piştî dagirkirina Efrînê li gundê Aqîbê yê girêdayî navçeya Şêrawa bi cih bûn û li wir dest bi xwedîkirina pez kirin.

**Ji berhemên pez debara jiyanê tê kirin**

Dayîka Xalîde anî ziman ku ew ji pezê li gel xwe berhemên weke mast û penêr çêdikin û difroşin û wiha got: "Piştî dagirkirina herêma Efrînê û talankirina gund û malên me em jî bi gelê xwe re derbasî herêmên Şehbayê bûn. Em ji kevin de lawiran xwedî dikin û ji berhemên wan dabara jiyana xwe dikin. li ser wê bingehê em li gundên Şêrawa yên ku neketine destê komên çeteyan de bi cih bûn. Navçeya Şêrawa ji kevin de bi kedîkirina pez û berhemên wê tê naskirin. tevî hemû zehmetiyan lê me dev ji pîvanên ku em li ser mezin bûne me berneda.

Li gorî derfetên me hejmarek ne zêde ji pez em xwedî dikin, ez û hevjîna xwe bi hev re van pezan kedî dikin. Ji şîrê ku rojane em ji pez didoşin; mast, penêr û mastê kelandî ku tenê herêma Efrînê çêdike em derdixin. Têrkeriya mala xwe em radikin û yê din jî em difiroşin û pê debara jiyanê dikin."

**`Em ê jiyanê ava bikin û vegera Efrînê misoger bikin`**

Dayîka Xalîde destnîşan kir ku çawa ew li ser çanda bav û dayîkên xwe mezin bûne, wê nehêlin dijmin bighêje armancên xwe û wiha bi dawî kir: "Gelê Efrînê xwedî çandeke dîrokî ye û ev çand heyanî roja îro me parastiye. Xwedîkirina lawiran û parastina xweza û berhemên wê jî yek ji bingehên me yên jiyanê ne. her çiqas dijim di koçberiyê de xwestiye ku vê çandê hedefbigire û me di aliyê îrade û berxwedanê de bişkîne, lê bi biryardarî û li ser bingeha wê rojek bê û emê di Efrînê de jiyan bikin de me li berxweda ye. Afirandina jiyanê rûxmî hemû zehmetiya, têkbirina dijmin misoger kiriye. ji lewra emê bi van derfetên jiyanê yên biçûk, jiyanê avabikin û vegera Efrînê misoger bikin."





# 'Bombeyên Erdogan di nav destê wî de teqiyan'

Hevserokê TEV-DEM'ê Xerîb Hiso diyar kir ku gel li herêmên dagirkirî li hemberî nejadperestiya li dijî koçberên Sûriyê yên li Tirkiyê, rabû ser piyan û li dijî dagirkeriya Tirk serî hilda. Herwiha Hiso da xuyakirin ku wekî Tevgera Civaka Demokratîk ew ê hedem ji bo maf û azadiya gelan têbikoşin.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Di demên dawî de kiryarên nijadperestî yên ku li hemberî koçberên Sûriyê yên li bajarên Tirkiyê tên meşandin, bû sedema nerazîbûn û xwepêşandanên gel li herêmên dagirkirî. Di van bûyeran de hat xuyakirin ku hebûna Tirkiyê li ser axa Sûriyê nayê pejirandin. Di derbarê xwepêşandanên ku li herêmên dagirkirî û nejadperestiya li dijî koçberên Sûriyê li Tirkiyê pêk tê, hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Xerib Hiso ji rojnameya me re axivî.

**Dewleta Tirk ya dagirker penaberan ji bona berjewendîyên xwe bi kar tîne**

Xerîb Hiso da xuyakirin ku armanca dewleta Tirk ya li hemberî penaberan ferasetekê nîjadperestîye û wiha berdewam kir: "Wekî tê zanîn di sala 2011'an de bi giştî axa Sûriyê, di encama rêvebirina ne rast ya desthilatiya Hikumeta Şamê gêşedan di axa Sûriyê de qewîmîn. Bi encama van geşedan û bûyeran, gelek koçber ji bona welatên cîran û yên derve jî çûn. Hin welatiyên Sûriyê çûn welatên Ereban û Awropa, herwiha gelek welatiyan jî berê xwe dan Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê. Ji ber ku piştî gêşendanên ku li Sûriyê de qewimîn, yên bi navê 'Bihara Ereban ' destpekê ji bona gel koçber bibe û bike mijara bazirganîyê, beriya hemû dewletên derdorê, dewleta Tirk ya dagirker sînorên xwe vekirin. . Wê demê dijberîyek navbera hikûmeta Şamê û dewleta Tirk ya dagirker hat jîyan kirin. Dewleta tirk ev bûyere jî ji bona berjewendîyên xwe yên bikar anî. Nêzî 4 milyon welatîyên Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê di Bakurê Kurdistanê û bajarên Tirkiyê jîyan dikin. Ti zagonên Tirkiyê ji bona di derbarê ewlehî û tendûristîya jîyanî derheqê koçberan da tine ye. Bi taybet welatîyên Rojavayê Kurdistanê her tim bi kiryarên nîjadperestîyê, kuştin, girtin û zordarîya nîjadperestên tirk û dewleta AKP'ê û MHP'ê rû bi rû dimînin .'

**Hikûmeta Şamê li hemberî wan kiryarên dewleta Tirk ya dagirker ker û lal e**

Di heman demê de Xerîb Hiso bibîrxist ku serhildanên gel yên di herêmên dagirkîrî de pêk hatiye û nerazîbunên li hemberî desthilatiya çeteyên Tirk û wiha dewam kir: "Dewleta Tirk ya dagirker li wan herêman di destpêkê de li Efrîn û Serêkanîyê di nav de bi revandinê niştecîhên wan deran bi destê çeteyên kirê kirî hewl didin çavên welatiyan bitirsîne. Ev kiryarê ku di hemberî penaberan tê meşandin dervî exlaq in û di ti zagonan de nehatiye nivîsandin. Li hemberî van kiryaran gelek herêmên dagirkirî gel rabûn serhildanan. Gelek saziyên di bin desthilatiya çeteyên bi navê Artêşa Azad û dewleta Tirk ya dagirker ve tên rêvebirin, hatin şewitandin û gel nerazîbûn nîşan dan. Pir bajarên dagirkirî jî alên Tirkên dagirker anîn xwarê di alîyê çalakvan û hejmarek zêde çete jî di nav de, rastî nerazîbunên gel hatin. Êdî rûyê rast yên dewleta Tirk ya dagirker giştî cîhanê ve xuyakirî ye. Desthilatîya AKP'ê û MHP'ê hewldan kir ku bi van çeteyên pere hatine kirîn hêza xwe bi domîne û ev bombeyên ku wan amade kirine destên wan de teqîya'

**Hevdîtinên di navbera Erdogan û Eseed de aloziyek mezin di nav gel de ava kir**

Xerîb Hiso di derbarê hevdîtinên navbera şefê faşîst Erdogan û serokê hikûmeta Şamê Beşar Eseed jî wiha got: "Erdogan ji bona ev hevdîtine pêk bên pir hewldan



kirin. Lê hikûmeta Şamê ev qasî hewldan nekirin. Ev hevdîtine bi du aliyên cûda di fikirin pêk hatin. Politikaya Şefê faşîst Erdogan li Sûriyê demên dawî de dimeşîne jî, sedem eve ku giranîya xwe ya ku hûndir de windakirî hewldan dide ku welatên wek Sûriyê û Iraq û Libya dîsa pîne bike. Ev xuyaye ku Erdogan tirs û xofek mezin jîyan dike. Ti sîyaseta ku hikûmeta Şamê li hemberî desthilatîya AKP'ê û MHP'ê bimeşîne nema ye. Ev kiryarane encamên îtîfakê peymana Edene pêk tên.'

**Rêya çareserîya aloziyê Sûriyê tenê bi ramanên Rêber Apo pêkan e**

Xerib Hiso di berdewamîya axiftina xwe de wisa anî ser ziman: "Ev aloziya ku Sûriyê û Rojhilata Navîn de dimeşe berpirsên wê dewletên hegemon û dagirkerin. Ev gêşedanên giştî û yên demên dawî de jî di herêmên dagirkîrî de qewimînî tenê dikare bi riya ramanên Rêber Apo çareser bibe, ti rêya cûda tine ye. Em wek TEV-DEM û saziyên civaka demokratîk jî, em ê heya dawiyê ji bona çareseriyê têbikoşin û fikrên Rêber Apo di nav gel de peş bixin'

**Şoreşa 19 Tîrmehê şoreşa hemû gelan e**

Hevserokê TEV-DEM'ê Xerîb Hiso bi hatina 19'yê Tîrmehê jî peyama pîrozbahî ji bona hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwest û axiftina xwe wiha qedand: "Em şoreşa 19'ê Tîrmehê li hemû gelên Kurdistanê û bi taybet jî gelên Sûriyê giştî de jîyan dikin em pîroz dikin. Şoreşa 19'ê Tîrmehê encama ked û xebatên hevkariya gelên li wan deran jîyan dikin e. Ji ber wê şoreşa 19'ê Tîrmehê Rêber Apo weke ' Şoreşa Gelan' bi nav kir. Bi rihê 19'ê Tîrmehê emê herêmên dagirkirî azad bikin. Di şoreşa 19'ê Tîrmehê şewqa xwe bide seranserî Sûriyê û Kurdistanê giştî. Li ser wê bingehê em dîsa wek Tevgera Civaka Demokratîk di serî de li avakerê şoreşa 19'ê Tîrmehê Rêber Apo re, bi malbatên şehîdan re pîroz dikin û ev pakrewanên ji bona wê şoreşê canê xwe feda kirin jî dîsa bibîr tînin û soza bilindkirina tekoşînê dûbare dikin.'

# 'Dagirkeriya Tirk dixwaze Başûrê Kurdistanê bike wîlayeteke tirkî'

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Rewşenbîr Ebûd Mexso diyar kir ku dagirkeriya Tirk bi hevkariya PDK'ê dixwaze Başûr bixe parçeyek ji Tirkiyê. Her wiha Mexso anî ziman ku hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re di şerê li dijî Gerîla ne di xizmeta gelê kurd de ye û eger ziyan bighêje Tevgera Azadiyê wê zerer bighêje tevahiya Kurdistanê.**

Êrişên dagirkeriya Tirk li ser axa Başûrê Kurdistanê bi hevkariya PDK'ê û bêdengiya hikumeta Îraqê didomin. Têkildarî heman mijarê hevserokê Yekîtiya Rewşenbîran a herêma Cizîrê, Ebûd Mexso bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Êrişên dagirkeriya Tirk li ser Başûrê Kurdistanê bi hevkariya PDK'ê pêwîste em çawa bigrin dest?**

Di serî de divê em armanca êrişên dagirkeriya Tirk li ser Başûrê Kurdistanê û Qadên Berxwedanê bidin diyaririn, wekî tê zanîn piştî ku Erdogan û AKP'ê di hilbijartinên şaredariyan de bi bin ketin, êdî dewleta Tirkiyê ji aliyê aborî û siyaseta xwe ya derve de şikest. Lew-



ma da ku dewleta Tirk pirsgirêkên xwe yên hundurîn çareser bike, dest bi hevdîtinên herêmî kir, berî demekê me dît ku Erdogan serdana Hewlêr û Bexdayê kir. Di roja îro de jî Erdogan ji bo berjewendiyên xwe dixwaze bi Esed re bicive. Piştî ku Erdogan serdana Başûr û Îraqê kir, me dizanîbû ku wê hin pilan li dijî Tevgera Rizgariya Kurdistanê werin danîn. Em dibînin ku îro pêngaveke dagirkeriyê li ser Başûrê Kurdistanê û Gerîla tê meşandin, ev yek jî bi alîkariya PDK'ê tê kirin. Bila PDK'ê bizanibe hevkariya bi dewleta Tirk re riyeke şaş e, eger ziyan bighêje Tevgera Rizgariya Kurdistanê wê ziyan bighêje her çar parçeyên Kurdistanê. Armanca jê xerbatir ew e ku Başûrê Kurdistanê bi hevkariya PDK'ê bike wîlayeteke Tirkî. Armanca dewleta Tirk a din ew e ku bi vê pêngavê çavê raya giştî ji pirsgirêkên xwe yên hundirîn bide girtin. Bê guman ev ne cara yekem e ku pêngavên êrişan li ser Gerîla tên meşandin, di salên 1990'î de pêngavên ji vê pêngavê dijwartir li ser Gerîlayên Azadiyê hatin meşandin. Di wê demê de dewleta Tirk bi hevkariya PDK'ê, YNK'ê, qirûçî, Israyîl, firokên emerîkî, êrişên ji van êrişên roja îro dijwartir da meşandin. Tevî wiha jî ji wê demê heya roja îro ti caran Gerîla neşikestiye û di baweriya me de ti caran naşke, ji ber ku Gerîla xwedî tecrube ne û di şeran de û di aliyê teknîkê de jî bi çekên xwe li pêş ketine.

**Li hemberî vê dagirkeriyê hûn bêdengiya hikumeta Îraqê çawa dibînin?**

Bêdengiya Îraqê ji hember van êrişên ku li ser Başûrê Kurdistanê û pilana dagirkeriya Tirkiyê tê wateya bêhêzbûna hikumeta Îraqê. Îraq ne di wê hêzê de ye ku li hemberî dagirkeriya Tirk bisekine, ji ber ku ew bi xwe ji hêz ketiye. Di heman demê de berjewendiyên dewleta Îraqê yên teng jî dibin sedem ku bêdengî çêbibe. Sedema yekem, Riya Eltenmiye an go Riya Geşedanê ya abûrî ye ku di navbera Tirkiye û Kendava Erebî de û wê di Îraqê re derbas bibe. Bi saya vê riyê, wê rojane bi sed hezarên dolaran têkeve ser abûriya îraqê de. Her wiha wê ava Çemê Firat û Diclayê xurtir bibe. Ev hemû peymanên ku di navbera dagirkeriya Tirk û dewleta Îraqê de çêdibin dikevin xizmeta abûriya Îraqê de. Li aliyê din gelên Îraqê bi kurd, ereb û pêkhateyên din zererê dibînin, bi taybet yên ku li ser sînorên Tirkiyê û Îraqê bi cih dibin. Hikumeta Îraqê berpirsiyar e di warê parastina gelên Îraqê de, lê Îraq bi van peymanên veşartî yên ku dikevin xizmeta berjewendiyên wê, xiyanetê li gelên xwe dike.. Beriya çend rojan Qes Xizeelî eşkere kir ku "Divê dewleta Tirk di demeke nêz de ji axa wan derkeve, eger ev pêk newe, em ê bi xwe li hember bisekinin." Ev yek jî tê wateya ku gelên Îraqê û gelek partiyên Siyasî ji van peymanan ne razî ne.

**Li hemberî hevkarî û xiyaneta PDK'ê bi dagirkeriya Tirk re pêwîste li ser asta Kurdistanî, herêmî û cîhanî çi were kirin?**

Di serî de hevrêziya kurdî her roj, meh û seet mîna ba, av û xwarinê ji bo gelê kurd pêwîst dike û xwedî girîngiyeke pir mezine. Lê mixabin hin partiyên kurdî bi taybet PDK'ê ku ketiye bin sîwana dewleta Tirk, pirsgirêkan ji bo yekîtiya kurdan derdixe. Ev yek jî ne tiştekî nû ye, hezar carî mixabin ku ji mêj ve heta roja îro PDK'ê van kiriyaran dike. Di serdema nemir Celal Telebanî de, PDK'ê li dijî Telebanî kar kir, şer di navbera herdû aliyan derket û bi hezaran ji pêşmergeyên YNK'ê û PDK'ê jiyana xwe ji dest dan. Ji xwe kiriyarên wê yên wiha hîn didomin, îro jî pêşmergeyan li dijî Gerîla bi kar tîne û bi dewleta Tirk re hevkariyê dike. Hêviya me ew e ku şerê birakujî çênebe. Banga me ji her pêşmergeyekî welatparêz re heye ku ji şerê li dijî Gerîla vekişe. Di heman demê de gelê kurd li Kurdistanê bi giştî û kurdên Başûr bi taybet li dijî hevkariya PDK'ê ya bi dagirkeriya Tirk re rabin ser piyan. Li aliyekî din em ji PDK'ê re dibêjin siyaseta te ya şaş û hevkariya bi dijmin re têkbirina kurdan bi xwe re tîne. Lewma heta ku PDK'ê ji riya xwe ya şaş vegere û hevrêziya kurdan pêk were, pêwîste kongreyekî netewî kurdî li ser asta Kurdstanê li dar bikeve. Her wiha em weke gelê kurd divê em hemû destê xwe û sînga xwe ji hev re vekin da ku em bibin hêzek li dijî pilanên dijmin û destkeftiyên xwe biparêzin.

# Hesen Koçer: Şoreşa 19’ê Tîrmehê bû hêviya serkeftina mirovahiyê

Ji bo pêkanîna xeyal û hêviyên gelên herêmê di avakirina civakeke exlaqî, demokrasiyeke rasteqîne, biratiya gelan û jiyana hevbeş, di 19’ê Tîrmeha 2012’an de şoreşê dest pê kir û ezmûneke nû li herêmê afirand. Ev şoreş bû hêzeke aktîf ku di gelek qadan de têkoşîneke girîng raber dike û ji bo parastina mirovahiyê fedakariyên mezin dide. Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser Hesen Koçer da zanîn ku şoreşa Rojava ji tevahiya gelên bindest re bû hêviya azadiyê.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Derbarê salvegera şoreşa 19’ê’Tîrmehê de, dengvedan û bandora wê Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Koçer bersiva pirsên Rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê jî wiha bû.

**Şoreşa 19’ê’ Tîrmehê heta çi astê dikarîbû li ser gelên Sûriyê û tevahiya gelên Rojhilata Navîn bandoriyê bike?**

Şoreşa 19’ê Tirmehê li ser bingeha tekoşîneke demdirêj a siyasî, civakî û çandî hatiye destpêkirin. Ev şoreş xwedî nirxeke pir dirokî û tecrûbeyên pir mezin in. Şoreşa 19’ê Tîrmehê ne wek şoreşên ku li Rojhilata Navîn de pêşketine. Bingeha wê li ser esasê hêz, rêxistbûyîn û çanda civakê pêş ket. Di navbera şoreşa 19’ê Tîrmehê û tevahiya şoreşên ku li Rojhilat Navîn pêşketine cudahiyeke pir mezin heye. Armanca sereke ji şoreşa Sûriyê û tevahiya şoreşên Rojhilata Navîn, destdayîna li ser desthilatdariyê bû, herwiha xwecihkirina li şûna sîstema beriya xwe bû, tu guhertin di nava civakê û zihniyetê de nedan çêkirin, tenê armanca wan desthilatdarî bû.

Lê ger em ji şoreşa 19’ê Tîrmehê bi vî rengî penase bikin, em nikarin navê şoreşê lê bikin. Şoreş tê wateya ku di bingehîn de civak, çand û demokratîkbûn pêş bikeve. Yanî armanca sereke avakirina civakeke exlaqî û polîtîke. Şoreşa Rojava jî li ser vî bingehê hat avakirin, şoreşê hêz û vîna xwe ji gelan girt.

**Şoreşa 19’ê Tîrmehê li ser asta Kurdistan û tevahiya cîhanê çi pêşketin bixwere anî?**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê weke şoreşa jin tê pênasekirin, ji ber ku azadiya jin tê de li pêşe, jinê di tevahiya qadan de cihê xwe girt, ev jî dide ispatkirin ku taybetmendiya vê şoreşê ne wekî taybetmendiya şoreşên dinin, herwiha mirov nikare wê weke şoreşên din jî şîrove bike. Li vir civak bi hêza xwe û îradeya ciwanên xwe parastina xwe dike. Herwiha gel bi bawerî, rêxistinbûyîn û vîneke mezi li ber xwe dide. Li vir esase îrade û hêza civakê ye, û civak wisa xwe birêve dibe. Li ser vî esasê şoreşa 19’ê Tîrmehê bandora xwe li ser hemû Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê kir.

Şoreşa Rojava yek ji şoreşên herî pîroz yên ku di dîrokê de hatine meşandin. Ji ber ku ev şoreş, şoreşa exlaqî, wijdanî û mirovahiyê ye. Di roja me ya îro de tevahî mirovahî û neteweyên cîhanê çavê wan li Rojava ye. Ji ber ku di nava şoreşa Rojava de tevahî hêzên demokratîk û tevahî mirovahî cih digire, ji ber wê çav û siyaseta hêzên hegemon jî li ser Rojava û şoreşa wê ye. Hêzên hegemon şoreşa Rojava weke gefekê li ser xwe dibînin, ji ber vê yekê tevahî hêzên NATO û bi taybet dewleta Tirk vê şoreşê weke gefekê li hemberî xwe dibîne. Lê Şoreşa Rojavayê Kurdistanê tu carî li hemberî desthilatdariya ku bi hezaran salin mirovahiyê dike koleyê xwe, serî netewand û hertim bi berxwedaniyeke mezin pêş ket. Ji ber vê yekê jî ev şoreş bû hêviya gelên bindest. Her çendî êrîş û gefên dewleta faşîst ya Tirk li ser Rojava û Şoreşa 19’ê Tîrmehê hene jî, ev tê wateya ku ev dewlet ewqas ji vê şoreşê ditirse.

Şoreşa Rojava nûnertiya xeta heqîqeta rastiya civaka ku cewherê xwe ji rastiya mirovahiyê digire, dike. Herwiha netewa demokratîk ku bingeha wê civakbûna rasteqîne ye di xwe de dide ava kirin.

Qasî ku di dîrokê de dijminên şoreşê hene, di heman demê de hezkiriyên azadî, aştî û wekheviyê jî li hemberî vê yekê hene. Her çendî dijminê gelê kurd û hevkarên wan bixwazin şoreşa 19’ê Tîrmehê têk bibin, wê ewqasî hezkiriyên azadî, aştî, wekhevî û dostên wan jî bi hevre li ber xwe bidin û şoreşa mirovahiyê biparêzên.

Şoreşa 19’ê Tîrmehê çirûska yekemîn di Kobanê de avet û DAÎŞ’ê têk bir. Berxwedana Kobanê bû bingeha şoreşa 19’ê Tîrmehê û li giştî Rojava belav bû, bandora xwe li ser her çar parçeyên Kurdistanê jî kir. Piştî şerê DAÎŞ’ê heqîqet derket pêş û şoreşê bandora xwe ne tene li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, li tevahiya cîhanê bandor kir. Ji ber ku li wir parastina tevahiya cîhanê kir. Bajarê Reqa jî ku çeteyan ew wekî paytexta xwe ragehandibû, piştî rizgarkirinê bûye peytexta netewa demokratîk, di heman demê de li giştî bajarê Bakur û Rohilatê Sûriyê de jî pirojeya Netewa Demokratîk pêş dikeve. Ger li hemberî DAÎŞ’ê berxwedînî nehatiba kirin, xeteriyeke mezin li ser tevahiya cîhanê çêdibû. Bi felsefa Netewa Demokratîk a ku Rêber Apo pêşxistiye, rihê berxwedanê li Rojava pêşket, li hemberî zîhniyeta îslama radîkal, li hemberî zîhniyeta netewperestiyê û cînsiyetperestiyê tekoşîneke pir xurt hate meşandin.

**Ji bo parastina şoreşa 19’ê Tîrmehê û destkeftiyên wê pêwêste çi bê kirin?**

Ev 12 sal di ser destpêkirina şoreşa Rojava re derbas dibin û gelek tecrûbeyên mezin jî bidestxist, li Rojava tecrûbeyên siyasî, leşkeri û rexistinî yên mezin hatine girtin. Şoreş ji ber ku di pêvajoyeke pir zehmet de derket, kemasî jî derketin. Ji bo ku em kêmasiyan nas bikin û analîz bikin, pêwêste em ji du milan ve lê binêrin. Ji milekî ve zirûfên derve û ji milê din ve jî yê hundirîn. Yên derve wekî êrişên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku ji destpêka şoreşa Rojava û heta niha dewam dikin û armanca sereke jê şoreşa 19’ê Tîrmehê bû. Herwiha hin tevger û partiyên kurd jî ketin nav liv û tevgerê û xwestin şoreşa 19’ê Tîrmehê reş bikin. Di aliyê aborî de jî dorpêçeke mezin hebû, li aliyekî Başûr û li aliyê din jî hikumeta Şamê dorpêç li ser Rojava dida ferizkirin.



Ya hundirîn jî, helbet civakeke ku bi 10’ê salan di bin sîstema dewletê de ewqas zilm û zor lê hatiye kirin, herwiha li ser zihniyeta dewletê mezin bûbe, ev zihniyet wê li pêşiya şoreşê astengiyên mezin çêbike, wisa civak fêrbûye ku bê desthilatdarî û bê dewlet ew nikare jiyan bike. Li aliyê din jî ewqas erîşên dewleta Tirk yên li ser heremên me taybet li Girê Sipî Serêkaniyê û Efrînê koçkirina gelê me bandoreke mezin li ser şoreşê dike. Rûsya destek da dewleta Tirk ku Efrînê dagir bikin, Amerîka jî destek da ku Girê Sipî û Serêkaniyê dagir bike. Vê heqîqet bandoreke neyînî li ser şoreşê kir. li keleka wî jî berxwedaniya gel û şervanê YPG-YPJ li giştî kudîstanê de dîrok nivîsandin û tekoşîneke bê hempa dan meşandin, ji bona rizgarkirina heremên dagirkiri ew berxwedana şervana heta niha jî berdewam dike.

Ji bona ku em şoreşa xwe bihêztir bikin û li tevahiya Rojhilata Navîn û cîhanê belav bikin, pêwîste em van rastiyan baş analîz bikin û binirxînin, herwiha pêwîste tekoşîna şoreşa me, di çarçoveya ku tecrîda li ser Rêber Apo bişkînîn pêwîstî bi tekoşîneke civakî û fikrî heye.

# ‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê encama fikir û felsefeya Rêber Apo ye’

**Navenda Nûçeyan**

**Mesûc Mihemed ê ku bi Rêber Abdulla Ocelan re civiyabû diyar kir ku Rêber Abdullah Ocalan girtîgeha Îmraliyê veguherand dibistana fikir û felsefeya navneteweyî û got: “Şoreşa 19’ê Tîrmehê encama fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e.”**

Welatiyê bi navê Mesûc Mihemed (47) ê ji gundê Selam ê girêdayî bajarê Dirbêsiyê ye û di 1992`yan de tevî çend ferdên malbata xwe û komek ji welatiyan li Akademiya Şehîd Mahsûm Korkmaz a li herêma Bîqa ya Lubnanê bi Rêber Abdullah Ocalan dîtin.



Mihemed bi fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocelan piştî dîtina wî bawer kir û got: “Dema min Rêber Abdullah Ocelan dît, ez bi heyecan bûm. Rêber Abdullah Ocelan bi saetan li ser avakirina şoreşê li Kurdistanê, welatparêzî û hezkirina welat axivî. Nêrîneke wî cuda hebû. Kesan ji cara yekê nas dike. Xwedî hêz û zanabûn bûn. Bûyerên li herêmê diqewimîn dizanî.”

Mihemed wiha domand: “Rêber Abdullah Ocelan bi civak û gel ve girêdayî ye. Şoreşa Rêber Abdullah Ocelan dest pê kiriye ji tevahî şoreşên li Kurdistanê hatine lidarxistin cudatir e. Vê şoreşê gelê Kurd zindî kir. Şoreşeke xurt û bi hêz bû. Bi fikir û felsefeya neteweya demokratîk tevahî planên dijmin ên bi armanca bidawîkirin û qirkirina gelê Kurd hatin têkbirin.”

**‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê encama fikir û felsefeya Rêbertî ye’**

Mihemed diyar kir ku komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan li pêş çavên cîhanê, rêxistinên mirovî, hiqûqî û civata navneteweyî pêk hat û wiha pê de çû: “Dewletên komploger Rêbertî girtin û xistin girtîgeha Îmraliyê. Ew dewleta tecrîda giran li ser wî ferz dikin. Nahêlin parêzer û malbat pê re bicivin û peywendiyê pê re bikin.”

Her wiha Mihemd destnîşan kir ku Rêber Abdullah Ocalan girtîgeha Îmraliyê veguherand dibistana fikir û felsefeya neteweyî û got: “Şoreşa 19’ê Tîrmehê encama fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e. Ji lew re li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dorpêç hatiye ferzkirin. Bi rêya wê yekê dixwazin Rêbertî ji gel bi dûr bixin, rê li pêş belavkirina fikir û felsefeya wî bigirin û siyasetên xwe yên faşîst li dijî gelê bi azadiyê bawer e pêk bînin.”

Mihemed anî ziman ku klîta çareserkirina doz û krîzên li Rojhilata Navîn fikirê Rêber Abdullah Ocalan e û pêdiviya gelê Kurd û gelên din ên aşiqê azadiyê ne bi analîz û perspektîvên Rêber Abdullah Ocalan hene. Ji lew re divê azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan pêk bê.

Di dawiya gotina xwe de Mihemed bal kişand ser dewleta Tirk a dagirker ku ji deh salan ve hewl dide gelê Kurd tune bike û nikare Kurdan qir bike û wiha got: “Divê tevahî di oxira pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan de têkoşîn û berxwedanê mezin bikin û heta pêkanîna azadiya wî ya fîzîkî li qadan bin.”



# ‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê encama keda Rêber Apo ye’

Hevseroka TEV-DEM’ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Ehmed da xuyakirin ku Şoreşa 19 Tîrmehê şoreşa jin û gelan e. Herwiha Rûken destnşan kir ku jina ku berê mafê wê yê axiftinê tine bû, pêşengtiya şoreşa gelan kir û wiha got: “Ji bona em bikarin deskeftîyên şoreşê biparêzin pêwîste em kar û xebatê xwe bighînin asta herî jor.”

**Navenda Nûçeyan**

Derbarê pêşwazîkirina salvegera şoreşa 19’ê Tîrmehê Hevseroka TEV-DEM‘ê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rûken Ehmed pirsên rojnameya me bersivandin û hevpeyvîn wiha bû:

**1-Şoreşa 19 Tîrmehê li ser asta Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê çi guhertin û veguhertin bi xwe re anî?**

Beriya şoreşa 19’ê Tîrmehê alozîyek mezin li ser axa Sûriyê giştî dihat jiyan kirin. Bi hişmendiya yek al, yek netew û yek ziman di mejîyê gelên ku pêkhateyên dervî gelê Ereb jî dabûn çandin. Lê beriya wê tenê desthilatiya Partiya Bees li axa Sûrî dimeşiya. Mafê jiyanê ji bona civakê ne hiştibûn. Li ser wê ferasetê ji bona netewperestiya Ereb gûr bikin û dijminahiya nava gelê kurd û ereb da ava bikin, di dîroka sala 2004‘an de bi leyîstoka werzîşê di navbera Tîma fotbolê Cîhad û Fitiwê pek hatiye de,hincet kirin şerê gelê kurd û ereb derxin. Bi rûyê rastî de ev leyistoka hikumeta Şamê bû. Êrîşên hikumeta Şamê di dîrokê de, bi destpêkirina serhildanên li bajarê Qamişlo pêk hatiye, di encamê de gelek kes şehîd bûn. Herwiha hejmarek welatî ji sedema wan serhildanan hatin girtin û hatin binçavkirin. Gelek endamên PYD’ê di bin zexta hikumeta Şamê de jiyana xwe ji dest dan. Gelek welatparêz û endamên tevgera azadîyê jî hatin windakirin û çarenûsa wan jî ne diyare. Di sala 2011‘an serhildanên bi navê `Bihara Ereban` destpêkir. Ev serhildan ji bona



gelê Kurd jî bû sedemek destpêka avakirina şoreşê. Siyaseta wan tenê li ser nîjatperestîyê dihat rêvebirin. Pêkhateyên din ti mafê wan yê jîyanê nema bû. Lê piştî destpêkirina şoreşa 19‘ê Tîrmehê, destpêkirina şoreşa gelên Sûrîyê bi giştî bû. Bi yekîtîyek mezin gelê kurd li her 4 parçeyên Kurdistanê ev şoreşe hembêz kir. Bi taybet gelê Bakûr û Rojhilatê Sûrîyê û gelê Rojavayê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe tevlî vê şoreşê bûn.

**2-Di milê jin û civakê de şoreşa 19 Tîrmehê çiqas pêşketin da avakirin?**

Bi destpêkirina şoreşê rol û misyona jinên herêmê yên serhilder û berxweder pir zêde bûn. Bingeha şoreşê jinê da avakirin. Şer kir, tekoşîn meşand û civak perwerde kir. Di aliyê sîyasî, civakî û leşkerî de jina Kurd di wê şoreşê de bû pêşeng û mînak. Hevalên yên ku tekoşiyan û canê xwe feda kirin ji bona şoreşê berxwedanî kirin, hevalên wek fermandar Jiyan Tolhildan li herêmên Minbic û Dêrazor raste rast cihe xwe girt, şer kir û tekoşîn meşand. Dîsa hevalên jin yên fedayî weke Arîn Mîrkanan, Zehra Goyîyan rolekê bê hempa wek fermandarên jin meşandin. Bi destpêkirina vê şoreşê re jin, ciwan û civak bi giştî pêkhateyên xwe ve ji bona xebatkirin, ji bona avakirina şoreşê kedeke mezin dan. Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi hêviya gelan pêk hat. Ji bona hemû gelên bindest bû çirûska azadiyê. Pergala jiyana hevbeş, pergala Rêveberiya Xweser û perwerdekirina civakê, ev guhertinek bi pêşengtîya jina Kurd û heremê da avakirin. Jinên rola xwe bi têkbirina DAIŞ’ê de, di çeperên pêş de cih girtibû, bû armanca dewleta Tirk ya dagirker. Di aliyê siyasî de jî bi pêşengtîya jinên weke Zeynep Saruxan û Hevrîn Xelef bi avakirin û pêşdebirina şoreşê de bûn mînakên jinên şoreşger. Avakirina meclis û komînan de bi keda Yusra Derwêş û Lîman Siwêş dibe neyê jibîrkirin. Di alîyê leşkerî û hêza xweparastin de jî pêşengtiya jinê pir asta jor hat dîtin. Jinên ku mohra xwe dîrokê danîn bi avakirina şorêşê jî hêza jinên şoreşger dane nîşandan.

**3-Ji bona ku deskeftiyên 19’ê Tîrmehê bên parastin û armancên şoreşê pêk werin, pêwîste çi were kirin?**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa avakirina felsefe û birdoziya Rêber Rêber Apo ye. Parastina wê şoreşê û deskeftiyên hatine bi destxistin bi rêxistinkirina civakê ye. Em çiqas di civakê de asta zanistî pêş bixin û perwerde bikin em ê bikarin deskeftiyên şoreşê biparêzin. Bê ku tu civakê perwerde bike, neteqeze tu bikarî nirxên girêdayî civakê biparêzî. Dema ku zanista civakê ya girêdayî welatparêziyê tune be, em nikarin xwe ser lingan bigirin. Ev keda 10 hezaran xort û jinên ciwan yên ku ruhê xwe feda kirine. Parastina şoreşê bi pêşxistina Şerê gelê şoreşgerî pêkane.

**4-Bi hatina salvegera şoreşa 19’ê Tîrmehê, peyama we çi ye?**

Gelek destkeftiyên şoreşê hatine avakirin. Derbarê parastina wan destkeftiyan di serîde rêxistinkirina civakî pêwîst e. Ji ber yên şoreşan diparêzê yan jî parastina nirxên hatine avakirin bi sîstemkirina civakê re pêk tê. Tu çiqas civakê xurt bike, birêxistin bike, zanista netewî, çandî, nasname û siyasî pêş bixîne ewqasî destkeftî bên parastin. Bê zanistkirina civakê ne mimkune ku ev nirx û destkeftiyên civakê bên parastin. Di dîrokê de jî gelek mînakên bi vî rengî hatine jiyîn.

Çawa ku roja 19`ê Tîrmehê de ew perdeya reş li ser civakê rabû û ev roj bû hêviya hemû gelan divê gelên me sala 2024`an bi hêz, baweriyê li qadan kombibe. Bi taybetî jî gelên li Kobanê gava yekem Rêber Abdullah Ocalan derbasî vê herêmê bû, şoreş û têkbirina DAIŞ`ê li vê herêmê destpê kir divê li qadan bin.

Divê hemû pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li şoreşa 19`ê Tîrmehê xwedî derbikeve. 19`ê Tîrmehê li hemû gelan serî de şehîdan, Rêber Abdullah Ocalan, malbatên şehîdan, gelên me yên welatparêz û gelên cîhanê cardin pîroz dikin.

## Aşîtiya Erdogan hîn bêhtir şer û xirabkirin e



**Zekî Bedran**

Erdogan, hewl dide bi Beşar Esad re hevdîtinê pêk bîne. Di vê mijarê de hewldanê xwe yên hevdîtinê, li ser rêya Rusya’yê didomîne. Ji bo ku têkiliyên xwe bi Surye’yê re sererast bike li pey hev daxuyaniyan dide. Erdogan’ê ji Beşar Esad re her roj digot “kujer” niha dibêje “ em bi Birêz Esad re li hev bên.” Ev çerxkirin ji bo Erdogan tiştekî normal in, ango ev yek klasîkeke Erdogan e. Heya dawî hêza xwe wê bikar bîne û xirabiyên ku bikê jî, wê bike. Dema hêza wî têr nekir, ango encam negirt jî, wê wisa bi vî rengî çerx bike. Ji wî re qural û qaydeyên însanî, exlaqî û wîcdanî ne derbasdar in. Wek bazirganekî ji rêzê tevdigere û her tiştî jî bi mejiyekî bazirganî digre dest.

Osmanî û Kemalîst bi Kurdan re pirsgirêk jiyan kirin. Komkujî, koçberî û bi darvekirin her tim hebûn. Di serdema Komarê de asîmîlasyoneke dijwar hat pêkanîn. Erdogan jî heman kiryar berdewam kir. Împaratoriya Osmaniya hewldaneke taybet raber dikirin da ku Kurda nêzî xwe bihêlin. Lê Erdogan li Rojavayê Kurdistanê bi destê çeteyên ku ser hevkirî, Kurd pelçiqandin. Bi destê çeteyan êriş bir ser Kurda. Bijartina xwe ji aliyê Kurda ve na, ji aliyê çeteyên DAIŞ û El Nusra kir. Van hêzan li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî tiştek nema ku bi serê Kurdan ve ne anîn.

Erdogan niha li ser ragihandina ku hatiye têrkirin re dêbêje “ez alîkarî didim Kurda, lê DYA jî dide terorîstan.” Erdogan ti carî alîkarî neda Kurda û nade jî. Yên ku alîkariya wan dike hêzên mîna PDK’ê, ango Barzanî ne. Ew jî, ji bo ku pêdiviya wî bi van hêzan heye bi kar tîne. Belê tenê bi kar tîne. Ger bi tena xwe bikarîbûya hêza gerîla bi pelçiqanda silav jî nedida PDK’ê. Ma gelê Kurd çi bi Erdogan kiribû ku berê çeteyên DAIŞ’ê da Kobanê. Jixwe wê demê Erdogan bi awayekî kêfxweş digot “Kobanê ket, ha wê bikeve.”

Li dijî çeteyên DAIŞ’ê cîhan bû yek, lê Erdogan berovajiya wê kir û li dijî Kurdan bi DAIŞ’ê re bû yek! Hewl dide ku bi hebûna PKK’ê diminayiha Kurda û xirabiyê li dijî Kurda mafdar nîşan bide. Jixwe DYA û Neteweyên Yekbûyî PKK’ê xistine lîsteya terorê de. Vê ya mîna çekekê di pêkanîna sucên mirovî û veşartina qirkirinê de bikar tîne. Niha DYA û Neteweyên Yekbûyî jî Hamas’ê weke rêxistineke terorîst bin av dikin, lê Erdogan dibêje “na ew mûdahîd in” û wan destek dike. Li gor berjewendiyên xwe di biryargirtina mijarên li dijî PKK’ê de ya xwe li ser gelan ferz dike.

PKK’ê tenê bi terorî û bi zextê bibîr tîne û bi vê yekê disepîne cîhanê. Jixwe di sala 2013’an de hevdîtinên ku bi Îmrali’yê re dikirin de ev mijar hatibû çareserkirin û bi salan tevî ku şer sekinî, ti cenaze jî nehatin. Rêber Apo, ji bo çareseriyê sebreke bêhempa û esnektiyeke mezin nîşan da. Di hevdîtina dawî ya sala 2015’an de got “bila hikûmet heyeteke çavdêriyê ava bike, ez ê jî kongreya PKK’ê kom bikim û li dijî Tirkiye’yê têkoşîna bi çek rawestе bangawazî bikim.”Erdogan li şûna ku heyeta çavderiyê ava bike û pêvajoya çekan bisekinîne biryara şer bijart.

Yê ku ji dewrê derxistina çekan asteng dike Erdogan bi xwe ye. Lê niha bi hemû cîhanê re hevdîtinê dike û li dijî PKK’ê tifaqan ava dike û destek jî digre. Hinceta wî jî “PKK’ê zextê bikar tîne, terorîst e” û hwd. Bi hemû cîhanê re li ser PKK’ê û pirsgirêka Kurd diaxive, dikeve mesrefên mezin. Aboriya Tirkiye’yê têk birin û hevsengiyên navxweyî xirab kirin. Li ser navê hiqûq û demokrasiyê tiştek nehiştin. Çi pêwîstî bi mirina evqas însan û windakirina ewqas aboriyê hebû? Bi Kurdan re hevdîtin û lihevkirin rêya herî hesan û herî bê mesref e. Vê çavsoriya wan hişt ku di xirabkirina Suriye’yê de pêşengiyê bikin. Niha jî ji Esad re dibêje “were em li hev bikin.” Dîsa ji bo Erdogan ya herî destpêkê dijminahiya Kurda ye. Rexmê hemû dagirkerî û qetilkirinan jî nedikarî Kurda tasfiye bike. Nikarîbû Esad bi qulibîne. Çeteyên ku li derdora xwe kom kiribûn di destê wî de man. Ji bilî bikaranîna çeteyan a li dîjî Kurdan, ti nirxekî wan nema. Niha jî wan çeteyan li dijî Esad, ji bo ku weke qertekê bikarbîne di destê xwe de digre. Naxwe rolekî din ku bi wan bide leyîstandin nîn e. Wan çeteyan mîna muxalefetê bazar kir, lê nehişt ku bibin muxalîf da ku nasnameyeke siyasî qezenc bikin. Wan mîna pîyonên ji rêzê û di statûya cehşan de hişt.

Erdogan li hindir û li derve tengezar e. Hebûna DYA’yê li Iraq û Surye’yê mijara nîqaşê ye. Iraq hebûna Amerîka’yê li Iraq’ê naxwaze. Ger di hilbijartinan de Trump werê hilbijartin tê hesibandin ku Amerîka ji Surye’yê vekişe. Di vê rewşê de wê hevsengiyên Surye’yê biguherin. Ger Kurd û herêmên xweser bi rêveberiya Esad re li hev bikin, wê dewleta Tirk hîn bêhtir bikeve zehmetiyan. Ti meşrudiyeta hebûna Tirkiye’yê di xaka Surye’yê de nîn e. Bi awayekî vekirî hêzeke dagirker e. Artêşa xwe di Başûrê Kurdistanê de bicîh kiriye û dixwaze hêza gerîla belav bike. Dixwaze têkiliya Başûr û Rojavayê Kurdistanê qut bike da ku bikaribe zemînê deskeftiyên şoreşa Rojavayê Kurdistanê bifetisîne ava bike. Di hesabê ku bi Esad re li hev bike û armacê xwe hîn hesantir pêk bîne de ye. Di heman demê de dibêje“ ez wan bi hevpeymaneke mîna mutabeqata Adana’yê razî bikim, wê her tim avantaja ku ez bikaribim mûdaxeleyî Surye’yê bikim, bi dest bixim.” Her wiha hesab dike wexta ku avakirina Surye’yê dest pê kir, di wir de jî para ku li wan dikeve bigrin û hwd.

Di cewher de lêgerînên Erdogan yên aşîtiya bi Esad re ti têkiliya xwe bi aşîtiyeke rasteqînî re nîn e. Ger aşîtî bixwesta wê artêşa xwe bikşîne, çeteyan belav bike û herî kêm qismek zirara ku daye tanzim bike. Di Surye’ke ku destê dewleta Tirk di nav de hebê de, ti carî aşîtiyeke rast pêk nayê.

## Li Kurdistanê hin pîlanên nû…



**Farûk Sakik**

Rojek di sohbetek bi rojnamevan Cahît Mervan re me qala PDK’ê dikir. Kesek digot ji bilî mijara PDK’ê mijar çi dibe bila bibe ez ê tevlî bernama Cahît bibim. Cahît digot; temam mijar tebaqeya Ozonê be jî, lîstka Futbolê be jî, pirsgirêkên hawirdorê bin jî, ez ê bînim bi PDK’ê ve girêbidim.

Ev îroniyek bû. Lê rastiya xwe jî hebû. Îroj di hemû geşedanên li Rojhilata Navîn û Kurdistanê de, di bin her kevirî de, navê PDK’ê û Barzaniyan derbas dibe.

Em ê behsa hevkariya PDK’ê ya bi dewleta Tirkiyê ya dagirker nekin. Em ê behsa serûbinkirina sîstema azadiya Başûr nekin. Em ê behsa dizî talanê nekin. Em ê behsa zextên li ser mixalifan nekin. Em ê hehsa belengaziya li herêmê heye ku sedem jî PDK ye nekin. Em behs nekin ku ji ber jiyana bêaramî koçberî dest pê kiriye. Koçkirina ji welat û di rêwîtiya penaberiyê de felaketên mezin pêk hatin. Em dikarin vê lîstê dirêj bikin, lê em li vê derê bîhnokek bidin.

Lê em ê behsa xiyaneta vê malbatê ya aktuel bikin. Li ser peyva xiyanetê gelek tiştên cuda tên gotin. Dibêjin wek malbata Barzaniyan bi kar neynin di malbatê de hin nirx hene. Pêşmergeyên ji artêşa Tirk re hevkarî dike nebêjin, Pêşmerge dîrokek xwe heye. Lê herkes dizane ku em ji kê re û ji çi re peyva xiyanetê bi kar tînin.

Artêşa Tirk bi tanq û topên xwe herêma Behdînan dagirkirin. Hin herêm bi dest xistine. Ev dever wê weke Efrîn û Serêkaniyê werin birêvebirin. Ev jî qîm nake wê malbatên çeteyên ku pişgirî dida wan û li hemberî ‘dîktator Beşar’ bi kar anîbû bîne li van herêman bi cîh bike.

Li aliyekê ev xebat tên meşandin û li aliyekê jî ji bo hevdîtina Erdogan û Beşar Baxdad tê destnîşan kirin. Erdogan berê ku here Baxdayê divê jetsek bide daxwazên Beşar. Daxwazên Beşar çibûn. Valakirina cihên dagirkirî û dawîanîna piştevaniya çeteyan. Ango di destpêkê de valakirina Îdlîbê. Îdlîb were valakirin wê ew malbat bi kûve herin?

Li gorî hin agahiyên bi dest ketine wê wan malbatan bînin li deverên Tirkiyê ji Başûrê Kurdistan-herêma Amêdiyê bi cîh bikin. Û herêmên hatine dagirkirin jî wê rêveberî dest biguhêre. Radestî ENKS’ê bikin. Lê bazarî û axaftin li ser navê ENKS’ê bi PDK’ê re tê çêkirin. Heyetên herdû welatan li Baxdayê hevdîtinan pêk tînin. Di qada îstixbaratê de berî ku Erdogan û Beşar werin gel hev, paqijiya rê tê kirin. Bi Esad re bazarî tên kirin.

Artêşa Tirk ketiye herêmê û wa amadekariya hatina malbatên çeteyan dike. PDK’ê jî li gel wan ji bo valakirina herêmê piştgirî dide dewleta dagirker. Ev kiryarên PDK’ê yekem car e di nav Kurdan de bi awayekî vekirî û bêtirs tê şermezarkirin.

Êdî ji bo Barzaniyan peyva “xiyanet” tê bikaranîn. Di serî de li Duhok û li gelek navendan meş tên lidarxistin. Di van meş û mitîngan de ne bi tenê dagirkeriya dewleta Tirk tê protestokirin, di heman demê de li dijî xiyaneta PDK’ê jî seknek heye.

Berê hêviyên gelek kesan hebû ku PDKMê were îknakirin da ku were di nav ‘yekîtiya Kurdan’ de cîh bigire. Mixabin ev hêvî êdî bê wate ye. Heger ji roja berê bihata zanîn ku israra wan a xiyanetê dewam dike, evqas êşên mezin li wê axê wê pêk nehata. Diviya helwesta ku îroj li Başûrê Kurdistan tê nîşandan berê bihata nîşandan. Lê dema ku em li dîmenên helwesta gel dinêrin, hêviyên mezin dide me. Kurdên ji vê malbatê, ji vê PDK’ê, ji vê xianetê rizgar bibin.